Ibin Teymiye

(1-2)

(1240-1307 Zayînî) (661-728 koçî)

Ji dev Ebî Hureyre, Xwedê jê razî be, hatiye ku:

Xwedê di seriyê her sedsalekê de yekî dişîne, ku ji vê neteweyê re ola wê serrast bike

(Ji Hedîsên cenabê pêxember, hem Ebo Dawûd bi senedekî dirist aniye zimên û hem jî Elh'akêm.)

November 14, 2009

Di dûroka Musilmanan de, navê **Ibin Teymiye**, wek mezintirîn şêxê olê têye dîtin, lew re ew bi "**Şeyxulîslam**" hatiye navkirin, û heta roja dawîn a vê olê, wê **Şeyxulîslam Ibin Teymiye** wekî bilindtirîn jêderê zanîna Islamê bimîne. Ev zanayê navdayî, wêrek, jêhatî, ku bêtir ji 100 kesên tev zana di cîhana Îslamê de, ta roja îro ji xwe re wî ji xwe re wekî "Şêxê mezin" dibînin, û gelek pesindariya wî dikin, ji xelkê **Heranê** bû, û **Heran** li bakurê Kurdistanê ye...

Em di va gotara taybet de, ku ji du paran e, li ser jîn û berhem û baweriyên vî zanayî radiwestin.

Bêguman, dema ku **Ibin Teymiye** têde ji dayîk bûye û jiyaye, demeke pir wêran bû di dûroka gelên Musilman de. Di wê rewşê de, bergeh li ber çi neteweyê bo paristina xwe tenê tune bû, pêdiviya hemî gelên Rojhilata Navîn bi hev hebû, da xwe ji qirkirin û talankirin û tunekirinê riha bikin. Diviya bû, ku ewan mil bi mil, di cengên berxwedan û kosaniyê de, li hember dawîtirîn hêrişên hêrişkarên Asiya, Mongol û Teteran (1095-1270 Z.) rawestin. Wan hêrişkar, wekî colên gurên çile, zikbirçî û devbixûn, bi ser bajêr û kelehên wan de hatibûn... Ji aliyê Europa ve jî, li hember wan hêrişên Xaçeperestan (1250-1382 Z.), ku wekî pêlên qitrana kelandî bi ser welatên Kurd û Ereban de hatibûn...

Bi ser ve jî, Musilman di nav xwe de, ketibûn bin deselatiya Memalîkan (1250-1382 Z.) li Misir û Şamê, û gelek mîrnişînên piçûk û bêhêz ji bin sîwana Xîlafeta Îslamî derketibûn, hinekan ji wan jî, bo paristina deselat û malbata xwe, ji Rom û Teter û Mongolan re bûbûn binbasik û davêtin ser hev.

Em dizanin, ku Teter û Mongolan ziyaneke çandeyî ya bêwekanî gihandin şaristaniya mirovî li Navendên Rojhilata Navîn ên wekî **Baxdad**, **Şam** û **Riha**yê, û em dizanin ku Xaçperestan rêç û şopên xûnî yên tew ji bîr nabin, li şûn xwe hêştin, ji **Antakiya** de ta bi **Iskenderiye**, û bi taybet li **Quds** a rûmetdar... Dûroknas ên Musilman û ên ne Musilman yekrayin, ku **Selahdîn** ê kurd, bi hişmendî û şîretên şêwirdarên xwe, bi wêrekî û cengewariya suwarên xwe yên lehengî, û bi fedekariya xwe ya bêwekanî, kenî bû Xaçperest bişkanda... **Hans Hauser**, nivîskar ê alman dibêje ku serkeftina **Selahdînê Eyûbî** di şergeha **Hittîn** de, li nêzîka zireya mirî (**Beh'ir Elmeyyêt**), rûyê

cîhanê guhart û nekêmtir giring e, di dûroka mirovatiyê de, ji serketina leşkerên Sovyêt û şikestina leşkerên Hitlerî di **Stalîngerad**ê de, dema Cenga Cîhanî ya Duwemîn.

Bêguman kîna Xaçperestan li ser ola Îslamê, li gel rewşa hejariyê, ya ku paş gelek cengên navxweyî li Europa pêda bûye, bûn egerên serekîn ên hêrişên Xaçperestan li ser Rojhilata Navîn, hema bo hêrişên Teter û Mongol û êlên dî, ji Rojhilat ve, hîç egerin olî an çandeyî tune bûn, tenha bo talankariyê û binvekirina gel û êlên biyanî hêrişên wan ên hovane çê bûn.

Di rewşeke wilo de, tûjkirina şirovekirin ên olî hîngê, ji herdu aliyan ve, çi Xaçperest û çi Musilman, siya xwe avêtin ser pareke mezin ji dûroka herêmê û ji Europa, heta axiftina Papazê Vatîkan, **Bênêdîktê Şanzdemîn**, di zanîngeha **Regensburg**ê de, li Almaniya di 12.09.2006 de, û serlêdana wî piştre bo Türkiyê, di 28.11.2006 Z. de.

Ji ber çavan naye windakirin, ku berî wê serlêdanê bi 911 salan pêş de, bi axiftina Papazê Filehan, **Arbanê Duwemîn**, di 26.11.1095 Z. de, li bajêrê **Klîrmont** li Fransa, Hêrişa yekemîn a Xaçperestan dest pêkir. Hîngê wî papazî daxwaz kir, ku heme cengên navxweyî yên Filehan rawestin, bi armanca avêtina ser Musilmanên "*Gawir ên ku Qudusa pîroz gemar kirine*!", bi ser ve jî Papaz soz da, ku ew gunahên heme kesên tev li cengên xaçperestî bibin, sîl bike û dêra katolîkî ji wan re dibe xalam "parêzkar".

Pêtrûsê evdal di Nîsana 1097ê Z. de ber bi bajêrê **Nîqiya** ve milyonek hêrişvan bir, ew bi destê xwe ve anîn û xist bin deslata **Bîzentiyan** û rêveçûna xwe ya xûnî pêş ve gudand, di 20.10.1906ê Z. de giha **Antakiya**. Ew bajarê ku bûbû navendeke şaristanî, ji aliyê Filehan ve hate tar û mar kirin, û hovtirîn kuştin têde çêbûn, 100.000 Musilman û Filehên rojhilatî û Ciho hatin serjêkirin, paş ku namûsa jinan û lawan hatin şikandin.

Teviya cîhana Musilman lerizî, û tirsê dilê mirovan girt, lew re ji bajêr û gund û kelehan bi xarê ve reviyan, û ji ber wê yekê ve jî, berxwedan û kosaniya Musilmanan di **Quds** a rûmetdar de pir mezin bû, tevî ku damekirina bajêr demekê dirêj kir. Hem dûroknasên Musilman û hem jî yên Fileh û Ciho, ji wan jî **Ibin ElEthîr, William ê Sorî, Ann Komenîn**, dota Qeyserê **Roma**, û **Robertê evdal** û gelek xaçperest jî dîdarin dûrokî ne, ku serjêkirina zarokên Musilmanan wekî lîsk û kêfxweşiyê dihate dîtin, destavêtina namûsên keç û jin û lawan di nav govdeyên serrjêkirî de, gelek roj û şevan çêbû, û ev hovîtî li ber çavên keşîş û evdal û xaçhilgêran dihate kirin, belku wan hovîtiyên leşkerê xwe wekî karin pîroz didîtin û dinirxandin.

Ji aliyekî dî ve, hêrişên Mongol û Teteran, ên wekî reşbayekî bi hêz, bi ser herêmê de hatin, bi hovîtiya xwe ne kêmtir bûn ji hêrişên Xaçperestan. Ewana ji welatên Turkistan û Mongolistanê di ser **Xurasan** û **Hemedan** û **Azerbeycanê** re wekî pêlên zireyê, ku di rojeke babilind de dilivin, hatin, di rêya xwe de, ber bi rojava ve, çi li **Hindistan** û **Secistan** û **Kermanê**, û çi li welatên dî, mirovatî vemirandin. Ne tenê êl û nijad û kesên ku ji xwe re biyanî û neyar didîtin, belku hinek gelên Turk jî qirdikin. Mirovên ku xwe ji nav destên wan bi revê azadkirin, ji welatên xwe derketin û ber bi çiya ve bazdan.

Dûroknasên wekî **Ibin Elethîr, Ibin Kethîr, Gîbon** ê ku li ser têkçûna Împeratoriya **Roma** nivîsandiye û gelek kesên ku li ser dûroka Rojhilata Navîn û kesayetiyên wê yên dûrokî rawestîne, li ser wan hêrişên hovane yekrayin, ku ewana wekî erdhejînekê bûn, û bo teviya mirovatiyê ziyanên mezin ên çandeyî û aborî anîn. Dema Teteran **Bexdad**, paytextê xîlafeta îslamî, di sala (1235ê Z.) de standine, xelîfeyê Ebbasî **Elmustee'sêm** kuştine, bajar talan kirine û

sotandine, rengê çemê **Dîcle** reş bû, ji ber ku wan piraniya pirtûkên bajêr avêtin avê. Di sala 1238ê de gava gihan bajêrê **Helebê**, li bakurê **Sûriyê**, û bi harîkariya Filehên bajêr, keleha wê hêzdar standin, Fileh di **Dergahê Toma** re bi xaçên xwe derbas bûn nav bajêr, pesindariya ola Îsawî kirin û gotinên nebaş bo Îslamê gotin, mey û bengî bi ser dîwar û dergahên mizgeftên Musilmanan de reşandin, û xelk binzor kirin, ku seriyên xwe ji xaçan re biçemînin, hema gelê bajêr ev yeke nepejirand û li wan rabûn, serî hildan, ewana binzor kirin, ku vegerine bazara dêra **Meryem**…

Di rewşeke wilo de, **Îbin Teymiye** jî, wekî zanayekî Îslamê li welatê Şamê, li hember Teteran derket **Cîhadê** û bangên wî yên tûj bo şikandina hêrişên filehî û teterî navdarin. Baş hatiye bi cîhkirin, ku **Îbin Teymiye** ne tenê bangewazî li ser menberên mizgeftan kiriye, da gelên Musilman li hember hêrişkaran mal û ol û canê xwe biparizin, ew bi xwe jî diçû şergehan û bi wêrekî dikete têkoşîn û pevçûnên xûnî, wekî li şergeha **Şeqhebê**, ya ku sala 1279ê çêbûye û Musilman têde bi serketine, û Teter bi binketine û reviyane. Li hember hovîtiya "**Heşaşan**" jî hem hişk û req rawestiye û hem jî bi wan re di sala 1283ê de ketiye pevçûnên xûnî, û gelek ji wan li ser destê wî vegeriyane ser rêya "Sunne", û dev ji wan talankarî û hovbaziyên xwe berdane.

Gelên Turk, Teter û Mongolan, bi xwe re ne talankirin, herifandin û sotandin anîn Rojhilat Navîn, wan bi xwe re "YASA" jî anîn. Ew **Yasa** ya wan a nenivîsandî, ji bavpîr û pêşseran ve mabû. Di Yasa ya wan de, gelek fermanên kuştinê hebûn. Gava yekî di ava nistî de bimîza dihate kuştin, gava bidîta ku kesek ji destgîran direve û wî nagire, ew dihate kuştin, ewê ku tiştek bixwara û ji wê xwarinê parek neda ên li gel xwe, dihate kuştin… û gelek ferman ên teng û tûj ên wilo. Di bazaran de, hêrişkarên rojhilatî bêdilovanî bûn, û masiyê wan ê mezin yê piçûk dixwar, û lew re gelên ku wan xistine bin destên xwe, tev belengaz bûn û nema mirov bi tewat dibin…

Bi ser de jî, ava çemê **Dîcle** bilind bû û **Bexdad**, ku mestirîn navneda çandeyî ya cîhana îslamî bû, tar û mar bû… û di sala 1280ê de kulî hêriş ser bax û zevîn û mêwedarên welatê **Şamê** kir, rewşa gundiyan ji ber wê yekê wêran bû û tevliheviyeke mezin di bazaran pêda bû.

Ibin Teymiye di demeke bahozên siyasî- civakî, ramanî û aborî de hat, demeke dirêj jî ji temenê xwe di zindanên welatên **Şam** û **Misir** de derbas kir, jîna xwe bi wêrekiyeke bê wekanî, bi hişmendiya zanyarekî pir giranbiha û bi xebatên herheyî, teva kir. Îro li teviya cîhana îslamî û li zanîngehên wekî (**Sorbon)** berhemên wî di ol û civak û siyasetê de, dibine bingeha lêkolînin gelek rêkûpêk li ser ola Îslamê. Ew xudanê bêtir ji (580) name, pirtûk, lêkolîn û defetran e. Bi taybet "**Fetwa**" yên wî, ku bêtir ji **37** cîld in, û hinek pirtûkên wî yên dî, wekî "**Elû'bodiyye: Koletî**", "**Raas il Huseyn**: Seriyê Huseyn" û "**Elwesiyye Elkubra**: **Weseka tev mezin**" di cîhana zanîna olî de pir navdar in. Paş nivîsandina pirtûka wî "***Nakokiya ol û hiş nîne***" bi sedan sal, ev mijar dibe mijara serekîn û benda pêşîn a lihevhatinê di (***diyaloga Vatîkan û zanayên Îslamê***) de, ku sala 2007 Z. li **Roma** destpê kiriye.

Îbin Teymiye kî ye?

Ibin Teymiye: Ehmed kurê Evdilhelîm kurê Evdiselam kurê Evdullah kurê Elxidir kurê Mihemmed kurê Teymiye, Bavê Qasim ê **Heranî** ye. Bavê wî jî bi navê (**Heranî**) navdar bû. Li ser egera bi navkirina "***Teymiye***" hinde çêrokên cihê-cihê hene, hema zanayê olî û dûrokî **Ibin Elneccar** gotiye, ku bavpîrê **Ibin Teymiye** Mihemmed kurê Xidir dayîka wî bi "**Teymiye**" navdikir.

Bavê **Ibin Teymiye** zanayekî jêhatî bû, li ber bavê xwe fêrbû bû zanînên xwe yên olî, û di jimaryariyê "*Matematîk*" de jîr bû. Ew li şûna bavê xwe (*Bavpîrê Ibin Teymiye*) bûbû şêx û qeral û xutbexundê **Heranê**, di sala 1246ê de ji dest hêrişên Teteran binzor bû, ku dev ji mal û bajêr û xelkê xwe berde. Wî koç kir **Şamê**, li wir di "Mizgefta mezin" de, danişgehke taybet ji wî re hebû, melexaneyeke wî ya bi navê "**Darulhedîs ê Essukeriye**" li taxa **Qessaa'** hebû, mala wî jî li wê taxê bû, û di sala 1249ê de koça xwe ya dawî kir, û di goristana **Essofiye** de hate çalkirin.

Hinek lêkolînerên Ereb bizava xwe kirine, ku nijadê **Ibin Teymiye** bigihînin êleke erebî, hema şêx **Ebû Zehre** -*Xwedê dilovaniya xwe bi ser de bîne*- di pirtûka xwe de li ser **Îbin Teymiye**, Dibêje ku nîşana "***ne Erebbûna Ibin Teymiye***", ewe ku Ereb neseba xwe bi êlê ve girê didin û neseba **Ibin Teymiye** bi bajêrê **Heranê** ve hatiye girêdan, ew bi **Elheranî** têye nasîn, Heran ne navê êleke erebî ye. Pişt re dibêje, ku rabûn û rûniştina wî, wêrekî û hişkbûna wî di ber maf de, diyar dikin, ku ew "**Kurd**" bû, ne "**Ereb**" bû. Hema bingeha gotina lêkolîner **Zuhêr Eşawîş** tew nîne, gava ew **Ibin Teymiye** wekî Erebekî **Numeyrî** dide nasîn.

Di nav merivên **Ibin Teymiye** de hinek zanayên dî yên navdar û nivîskar li **Heranê** hebûn, ji wan jî **Mecdiddîn Ebûl Berekat ê Heranî**, ku sala 1169 Z. ji dayîk bûbû û sala 1231ê koç kiribû.

Dayîka **Ibin Teymiye** jî ji **Heranê** bû, ku navê wê **Sitî**, dota **Evdirehman Evdûsê Heranî** bû, û dora 70 salî jiya bû, dawî li **Şamê** sala 1295ê Z. koç kiribû.

Ibin Teymiye sala 1240 Z. li **Heranê** ji dayîk bûye, û tê gotin, ku roja jidayîkbûna wî rast roja jidayîkbûna hezretî pêxember **Muhemmed** -*Selewat û silav lê bin*- hatiye, ku di 12ê Rebîû'l Ewwel de bû. Di sala 1307 Z. de jî koç kiriye –*Xwedê dilovaniya xwe li wî bike û di saya xwe de, roja ku sî ji ya wî pêve nîne, biparize*-.

[*Bermayê gotarê heye*]